Asîmanekî di sereçûyî

Silêman Azer

Asîmanekî di sereçûyî,
ji bêrîkirinan, ber bi tîbûn û tazîbûnên te ve diherike.
Bar kirî, biveşartinan û zelaliyên xwe yên riswabûyî di kûraniya lepên Xwedayetiyê.
Di spêre, kore riyên sînga xwe guvaştî.
Nelivandinên xwe yî, sitimî, valabûnin, deqandî bi sersariyê.
Guheztine, şevbuhêrkên sergêjiya we.
çîrokê qerax û cihine, kavilbûyî li ber deng û bînayiya mijûliyê.
Lorandiye, li ser zendê tevizî bi xilmaşiya, pêçayî bi veciniqandinan.
Dipijiqe cendekê rewaniyê.
Li ser wan dilbijandinan.
Tu fûriye kela keskahiya xwe.
Tu çandine, di bin awirên hêviyên bi tava xwe şuştî.
Hilweşiyayî, li ber dengvedana wê xweşiyê...
Ji bîr nabe, dilopên, noşandina te yî raxistî.
Bûrinek tir.
Qewartîne tê şêlana demkokin, bi mêtina, hejîna wî.
Dipelînin sîwankirina wê şîniyê.
Tu ziwa bû ji girnijînên wê barînê.
Li ser rûdêmê wê sariyê.
Ma valaye Xweda...?
Ji bicîkirina kesmê te re di henteşa tenêtiya xwe de.
Û li malzaroktiya te, biweşîne henasên xwe, ji bo bergirtina wê rûmetiyê...?